# Hevpeyvîna Qebûlkirî (Hevpeyvîna Tirkiyeyê re)

Di Hezîrana 2021-an de, hukûmeta Yewnanîstanê ragihand ku Tirkiye ji bo hemwelatiyên Sûriye, Afxanistan, Somalî, Pakistan û Bangladeşê welatek ewledar e. Eger hûn yek ji van welatan in û hûn li Yewnanîstanê daxwaza penaberiyê dikin, dê tenê hevpeyvînek di derbarê Tirkiyeyê de (Hevpeyvîna Tirkiyeyê re) ji aliyê Xizmeta Penaberiyê ya Yewnanîstanê ve were kirin da ku em biryar bidin ka daxwaza weya **penaberiyê** li Yewnanîstanê qebûl dibe an na. Ev hevpeyvîn ji bo destnîşankirina vê yekê tê kirin ka hûn dikarin li şûna ku daxwaza xwe ya penaberiyê li Yewnanistanê bidomînin vegerin Tirkiyeyê.

**Qanûna nû bandorê dêxe ser kî?**

Kesên ji Afxanistan, Somalî, Pakistan, Bangladeş, Sûriye ku li girav an axa Yewnanistanê de ne

- Kesên ji 15 salî mezintir *(eger zarokên we yê 15 salî û mezintir hebin, bi wan re tê hevpeyivîna Tirkiyeyê bête kirin. Zarokên bêy hevrêyên mezinsal ên 15 salî û mezintir jî dê ev hevpeyivîn hebin. Hevpeyvînên ji bo nûciwanan divê balê bikişînin ser berjewendiyên zarokan)*
- Kesên ku hîna daxwaza penaberiyê nekirine *(dema ku hûn daxwaza xwe ya penaberiyê qeyd dikin û karta xweya spî werdigirin, Xizmeta Penaberiya Yewnanîstanê dibe ku ji we di derbarê Tirkiyeyê de bipirse an jî ji bo beşdarbûna li hevpeyvîna Tirkiyeyê re tarîxek din bide we)*
- Kesê ku li Yewnanistanê daxwaza mafê penaberiyê dane lê hîn hevpeyvîna xwe ya penaberiyê neqedandine *(dibe ku hevpeyvîna we ya penaberiyê ji bo meh/salan hatibe plansaz kirin, lê hûn berê vê ji bo hevpeyvînek Tirkiyeyê re werin gazî kirin. Eger hevpeyvîna weya penaberiyê zû were birêve birin, ew ê nuha hevpeyvînek Tirkiyeyê re be)*

**Agadar bin:**

- Dibe ku hûn di demek pir kurt de - carinan tenê çend rojan - ji bo hevpeyvînek "pejirandinê" werin gazî kirin
- Dê bi hemî endamên malbatê re bi cudahî hevpeyvîn were kirin, pêdivî ye ku hesab cuda bin
- Her tiştê ku di hevpeyvîna qeydkirina we de hatibe destnîşan kirin (dema ku we karta xweya penaberiyê stend) dikare ji aliyê xizmetê penaberiyê ve bi ya ku hûn niha bêjin, were kontrol kirin.

**Ji Xizmetê Penaberiya Yewnanîstanê re bêjin:**

- Eger we daxwaz kiriye ku hûn bi endamek malbata xwe ya nêz re li deverên din ên Ewropayê werin cem hev (eger hûn bi rêbaza Dublînê de ne, divê hûn hevpeyvîna Tirkiyeyê nekin, ji ber ku we li welatek ku malbata we li wir dimîne daxwaza penaberiyê kiriye).
- Eger li Yewnanîstanê endamên malbata we yên nêz hene ku li Yewnanistanê mafê penaberiyê an destûra rûniştinê ya din wergirtine (divê têkiliyên malbatî li welatê we de hebe)
- Eger we endamên malbatê yên nêz hene ku xelkê Afxanistan, Somalî, Pakistan, Bangladeş an Sûriyê nînin

**Qanûna nû tevî ku hûn di bin xeterê de bin jî derbas dibe, lê eger gengaz be pirsgirêkên ku hûn li Tirkiyeyê pê re rû bi rû bûne, bêjin û pêşkêş bikin.**

- Pîrbûn - Nûciwanbûn
- Pirsgirêkên bijîjkî (di nav de psîkolojîk) - Dêûbavek yekane
- Astengdar - Ducanî

**Eger piştî hevpeyvîna pejirandinê ya li Yewnanîstanê biryar erênî be tê çi bibe?**

Eger we piştî hevpeyvîna Tirkiyeyê de biryar erênî da, ev tê vê wateyê ku Xizmetê Penaberiya Yewnanîstanê qebûl dike ku Tirkiye ji bo we ne ewle ye û hûnê pêvajoya penaberiya xwe li Yewnanistanê didomînin. Pêdivî ye ku hûn li bendê bin da ku ji we re bê gotin ka hevpeyvîna rastîna we ya penaberiyê dê kengê be.

**Piştî redbûna hevpeyvîna pejirandinê ya li Yewnanîstanê ez çi bikim?**

Hûn dikarin bi alîkariya parêzerekî Yewnanîstanî di nav 20 rojan de ji biryarê gazî bikin. Biryara ser we yan dê di dema diyarkirî de ji aliyê Xizmetê Penaberiyê ve ji we re were dayîn, an bo posteyê tê ji we re bête şandin an jî radestî kampa we bibe. Mawe ji roja ku hûn bi fermî biryarê distînin tê hesibandin. Eger bi posteyê ji we re hatibe şand, tarîxa wergirtinê li ser paketê hatiye destnîşan kirin û divê hûn paketê wekî delîl ragirin.

Eger îtiraza we jî were redkirin, hûn dikarin biçin dadgehê, lê ev pêvajo tevlihev e û dirav jî dixwaz e. Pêdivî ye ku hûn bilez ji saziyek an parêzerek pispor şîreta dadrêsî bistînin.

**Eger daxwaza min a penaberiyê "ne pejirandin" be we tê çi wateyê?**

Eger piştî hevpeyvîna Tirkiyeyê hûn neyên pejirandin û îtiraz nekin an daxwaza we hate redkirin, ev tê vê wateyê ku hûn nekarin daxwaza xwe ya penaberiyê li Yewnanistanê bidomînin û tê çaverê kirin ku hûn vegerin Tirkiyeyê. Hûn ê hemî piştgirî an stargehên hukûmetî winda bikin. Ji hêla hiqûqî, hûn dikarin bên binçavkirin û bi zorê vegerin Tirkiyeyê, lê hîn ne diyar e ka di pratîkê de tê çi bibe.

**Divê hûn di hevpeyvîna pejirandinê de babetên jêr bêjin:**

- Pirsgirêkên kesane yên ku we li Tirkiyeyê hebûn, mînak ji ber nijad, ol, netewe, baweriyên siyasî, koma etnîkî, regez, zayende
- Pirsgirêkên ku we bi rayedarên Tirk re kişandine, ji bo nimûne dema ku hûn di hundur an derveyî Tirkiyeyê re derbas dibûn, an her şîdeta polîs/artêşa Tirk li Tirkiyeyê
- Hemî pirsgirêkên ku we di dema hewildana penaberiyê yan pêvajoya penaberiyê de li Tirkiyeyê hebûn, di nav wan de belgeyên ku ji we tên xwestin ku ji Tirkiyeyê derkevin an qedexekirina ketina nav axa Tirkiyeyê.
- Her hewildana rayedarên Tirk ji bo derxistina we an paşve kişandina we li ser sînor
- Her tirsên vegerandina bo welatê sereke yê xwe ji ber kiryarên rayedarên Tirk
- Her heyama binçavkirinê ya li Tirkiyeyê û şert û mercên ku we li her wargehek girtî/qereqola polîsan/navendek dersînorkirinê hwd hebûne.
- Her pirsgirêkên ku li Tirkiyeyê bi wergirtina dermanên bijîşkî an piştgiriyek din re hebûn.
- Her pirsgirêkên di radestkirina stargeh, xwarin an pêdiviyên din ên bingehîn li Tirkiyeyê
- Her tecrûbeyek li Tirkiyeyê ku hûn mecbûr mane ku bixebitin (îstîsmara zayendî jî di nav de) an di bin şert û mercên îstîsmarê de bixebitin

**Hevpeyvînek meqbûl ji bo we hatiye destnîşan kirin ku hûn tenê behsa Tirkiyeyê bikin**, lê bêjin:

- ❖ Ka çima we welatê xwe terikand, tê de her şîdet, muameleya xerab an girtîgehê ku we li wir dîtibû *(Eger gengaz be, divê hûn destpêkê agahdariyên dadrêsî/şêwirmendiyê bikar bînin)*
- ❖ Çawaniya mayina li Yewnanîstanê, di nav de çûna zarokên we ji dibistanê, hînbûna zimanê Yewnanî, beşdarbûna di xizmetên piştevaniya bijîjkî an derûnî li vir

**Pirsên ku dibe ku ji we bêne pirsîn:**

- ➔ We kengê welatê xwe yê sereke terikand û berî Yewnanîstanê hûn derbasî kîjan welatan bûn?
- ➔ We çawa sînorê Tirkiyeyê derbas kir? Pirsgirêka we di derbaskirina sînor de hebû?
- ➔ Berî ku hûn werin Yewnanîstanê hûn çiqas li Tirkiyeyê man?
- ➔ Hûn berê çûbûne Tirkiyeyê?
- ➔ Çima hûn ji Tirkiyeyê derketin?
- ➔ Gelo qet têkiliya we bi rayedarên Tirk re hebû ye? Eger wusa be, hûrguliyan bidin.
- ➔ We daxwaza penaberiyê an rûniştinê li Tirkiyeyê kiriye?
  [Eger na] Çima? [Eger erê] ji we re destûra rûniştinê an destûrek hatiye dayîn?
  Çi belgeyên pêwendîdar hi we re dane? Gelo we ew bi xwe re hene?
- ➔ Hûn li ku derê li Tirkiyeyê dijiyan?
- ➔ Gelo hûn li Tirkiyeyê dixebitin? Eger erê, we destûra xebatê hebû?
- ➔ Li Tirkiyeyê endamên malbatê/xizm /heval /nasên we hene? Eger we hebe, rewşa wan çawa ye?

- Gelo hûn difikirin ku hûn dikarin vegerin Tirkiyeyê? Eger na, ji kerema xwe şirove bikin